
**BINPÊKIRINÊN MAFÎ, GEŞEPÊDANÊN LI GIRTÎGEHA
ÎMRALIYÊ YÊN SALA 2018AN Û RAPORA DESTNÎŞAN
KIRINA REWŞA HEYÎ**

I. DESTPÊK

Di sala 2018an de awayê birêvebirinê yê nedemokratîk li Tirkiyeyê yekcar zêde bû. Rewşa Awarte ya bi hewlidayîna derbeyê ya 15-20 Tîrmehê ya 2016an bi biryarnameya di hukmê qanûnan de hat cih bi cih kirin. Di demên buhurî de biryarnameya dembuhurî bi nehuqûqî kirin qanûn û daîmî. Rûdana herî bingehîn a vê rewşê wek ku di dîroka Pergala Tecrîdê ya Îmralityê ya 20 salan de pir rastlêhatin çêbûye li Girtîgeha Îmralityê qewimiye. Paşê bi taybetî di sala 2018an de biryarname veguherîn yasayan, tecrîd di bin navê yasayan de hatiye xwestin ku berdewam bibe. Lê divê were zanîn ku dewam kirina li van kirinan di bin navê yasayan de tevî ku wesfê huqûqî bûnê nade li gor pîvanên mafê mirovî yê gerdûnî ne mimkûn e ku mehkûm bibe û rê li ber herifandinê bigire.

Li ser vî asasî mafê hevdîtina bi parêzer û malbatê re, axaftina bi telefonê, hevdîtina bi rêya name û faks û bi her awayî mafê hayîdar bûyîna ji hev û din bê îstisna ya miwekîlên Birêz Abdullah Ocalan, Hamili Yıldırım, Veysi Aktaş û Hayri Konar ji holê hatine rakirin. Ev rewş di heman demê de ji xeynî bînpê kirina gelek mafan tê wateya ‘‘ Tecrîda Teqez’’ a êşkenceya bi pergal e. Qedexhî bûyîna êşkenceyê herî pir li Girtîgeha Îmralityê tê binpe kirin. Şik û gumana têkildarê tevahiya madî û menewî ya miwekîlan tê parastin an na roj bi roj hê zêde dibe.

SERLÊDANÊN JI BO SERDANA GIRTÎGEHÊ HATINE KIRIN

Piştî hevdîtina dawî ya bi parêzeran re ya di 27ê Tîrmeha 2011an de pêk hat, temamê hevdîtinên parêzer-miwekîlan heta 20ê Tîrmeha 2016an bi hinceta ‘‘arîzeyê keştiyê û ne xweş bûyîna hewayê’’ bi nehuqûqî û kêfî hatine asteng kirin. Piştî vê dîrokê serlêdanên hevdîtinê bi nîşandana wek hincet a biryara Karê Cihêreng ê 2016/56 bi dîroka 21.07.2016an ê Dadgêriya Bûrsayê hatine red kirin. Biryara heyî tevî ku her çar miwekîlan jî hukm xwariye, bi xalên 114/2-3, 115/1 yên bi hejmar 5275 sepandina wan ne mimkûn e bi ser girtiyên hukmxwarî de hatiye dayîn. Madeyên têkildar ên biryarên di hukmê qanûnan de yên bi hejmar 667 û 676 ên paşê hatin ragihandin û li dijî rêgeza qanûnî bûyîna di ceza û sûcan de piştî îtirazê kirine wek palpiştên bi otomatîk. Li gor vê biryarê miwekîl heta ku rewşa awarte hebe agahdar bûyîna ji hev û din bi nivîskî, danîna têkiliyê bi derve re û qebûl kirina serdanêran li wan hatiye qedexa kirin. Heta 28.02.2018an serlêdanên hevdîtinê bi vê hincetê hatine asteng kirin.

Serlêdanên hevdîtinê yên di du mehên pêşî yên sala 2018an bi biryara bi dîrok 21.07.2016an hatine asteng kirin; di 02.03.2018an da Dadgêriya Înfazê ya lemîn biryareke din a asteng kirinê bi hejmar 2018/2 daye.

Ev biryar bi zêde kirina sererast kirinên têkildarî biryarên di hukmê qanûnan de li Yasayê Înfazê yê bi hejmar 5237an hatiye bi meriyet kirin. Dadgêriya înfazê di vê biryarê de biryar daye ku qebûl kirina serdanên têkildarî miwekîlên me, agahdar bûyîna ji hev û din bi nivîskî û axaftin bi telefonê werin sînordar kirin, hevdîtin bi parêzeran re were qedexe kirin û belgeyên dê parêzer bidin werin sînordar kirin. Li ser îtiraza ji bo biryarê hat kirin, Dadgeha Cezayên Giran a 1emîn di 26.04.2018an de bi eshî îtiraz yek bi yek red kirin; bi 6 mehan qebûl kirina serdanêran qedexe kir, bi 3 mehan agahdar bûyîna ji hev û din bi nivîskî û hevdîtin bi telefonê hatin sînordar kirin, hevdîtin bi parêzeran re bi 6 mehan hat qedexe kirin, belgeyên dê parêzer bidin bi 3 mehan hatin sînordar kirin.

Xalên 59/4-5-7-8 ên yasayê bi hejmar 5275 ên wek palpişt tên nîşan dayîn ji bo biryarên Dadgêriya înfazê û Dadgeha Cezayên Giran halê xala 6emîn biryarnama bi hukmê qanûnan a bi hejmar 676 e. Biryara bi palpişt nîşandana xala 59emîn a yasayê bi hejmar 5275 a ku bi nehuqûqî kirine qanûn ji bo miwekîlên me jî tu şertên xwe yên pêkanînê nîn e. Ji bo dayîna biryarê ji bo qedexe kirin û sînordar kirinên di beşên 5-7-8 ên di xala heyî de bi cih in, wek ku ji qanûnî jî tê fam kirin divê gelek şertên qanûnî bi hev re pêk werin. Lê ji bo serlêdana parêzeran a bi dîrok 02.03.2018an bêyî pêkhatina tu şertekî xala 59emîn biryara qedexe kirin û redê hatiye dayîn. Ji bo hikm bê dayîn li gor qanûnê wek bone tê nîşandan divê hevdîtina parêzerek û malbatê pêk bê. Di vê hevdîtina heyî de bi awayê ku qanûn lê digere divê zanyarî, nîşane û belge bèn peyde kirin. Ji bo qedexe kirina serdan û hevdîtinan jî divê bi îdiaya ku hevdîtin neqanûnî tê kirin were bi dawî kirin û bi girtekê ve were girêdan. Lê ligel tê zanîn ku ji 27ê Tîrmehê heta bi niha tu hevdîtineke parêzeran çênebûye, bêyî pêkhatina tu şertekî ji van şertan bi awayekî nehuqûqî biryar hatiye dayîn. Îdiayên ji aliyê Dadgêriyê Înfazê ve wek palpişt tên nîşan dan û Dadgeha Cezayên Giran jî qebûl dike û tevahiya cezayên dîsîplînê yên behsa wan tê kirin cezayên dîsîplînê yên bi tarîx kevin ên salên 2005-2009an in.

Qedexehîya hevdîtina bi malbat û parêzeran re bi 6 mehan a ji Dadgêriya Înfazê ve hat dayîn di 02.03.2018an de tevî ku divê di 02.09.2018an de dawî lê bihata li hember serlêdanên ji bo hevdîtinê di 06.09.2018an de bi biryara bi esas a bi hejmar 2018/4513 ê 06.09.2018an ê Dadgeriya Înfazê ya Bursayê cardin bi 6 mehan hevdîtin bi parêzeran re hatiye qedexe kirin. Bone û palpiştên biryara heyî hatiye dîtin ku bi biryara hejmar 2018/2 ya Dadgêriya Înfazê ya 1emîn a Bursayê ya 02.03.2018an re bi temamî yek e.

Biryara sînordar kirinê ya têkildarî serlêdanên hevdîtinê yên malbatan a ji aliyê Dadgêriya Înfazê ya 1emîn a Bursayê ve di 02.03.2018an de hat dayîn bêyî hebûna palpişteki huqûqî hatiye dayîn. Di tu xalên 59. 114. û 115. yên yasayê bi hejmar 5275 ên ji bo biryara bisînor kirinê tên nîşandan de xusûsa qedexe kirina serdana malbatan nayê sererast kirin. Tevî vê yekê qedexe kirina serdana malbatan mînakekî sînornenas ê girîng ê kêfîyetê ye.

Di biryara bi tarîx 6ê Îlona 2018an ê di qedîna biryara bi tarîx 02.03.2018an ê Dadgêriya Înfazê ya 1emîn a Bursayê de qedexehîya hevdîtina malbatan nîn e. Ji bo serdana hevdîtinê ya malbatan di 10ê Îlona 2018an de hatiye dayîn bersiva “keştî xerabe ye” hatiye dayîn. Serlêdana hevdîtinê ya malbatan a bi tarîx 17.09.2018an jî bi boneya hebûna bisînor bûyîna hevdîtina malbatan a bi 3 mehan û biryarên bi hejmar 2018/1-2-3-4 ên bi tarîx 14.09.2018 ên Desteya Dîsîplînê yên Girtîgeha Îmraliyê hatiye red kirin.

Hewldanên parêzeran tev ên têkildarê Desteya Dîsîplînê hatine kirin bêencam hatine hiştin, revî revî kirarî li dosyeyan hatiye kirin, dosye hatine erê kirin û tegez kirin.

Dosyeyên li Dadgêriya Înfazê ya 1emîn a Bûrsayê hatine çêkirin ji aliyê Dadgeha Cezayên Giran a 1emîn a Bûrsayê ve hatine erê kirin û tekez kirin. Lê naviroka dosyeyan bi tu awayî bi parêzeran re nehatiye par kirin. Ligel ku bi ragihandina dayîna biryaran a desteya dîsîplînê daxwaznameya îtirazê ya bi wekaletname hatiye pêşkêş kirin nehatiye hiştin ku parêzer tevî tu merheleya dosyeyê bibin. Biryara Desteya Dîsîplînê û Dadgêriya Înfazê ya ku navirok tê de ye bi tu awayî nehatiye ragihandin. Lê beşê encamê yê biryara Dadgeha Cezayên Giran demek bi şûn de hatiye ragihandin. Nivîsên daxwazê li şûna biryara dadgehê bi nivîsa “girtêk” a nehuqûqî hatiye red kirin. 3 dadgêrên bi dosyeyê re mijûl ji ber sedemên tendurustiyê ya destûra xwe bi kar aniyê ya jî cihê wan ê peywîrê hatiye guhertin. Di rewşa heyî de hêj jî têkildarî naviroka dosyeyê tu salox nehatiye par kirin. Di der barê vê demajoyê de îtirazên pêwîst ên têkildar di wext de hatine kirin, li peywirdarên darazê yên berpîrsiyar serlêdana gilî û sûc hatiye kirin.

Ligel ku 3 meh qewlê sînordar kirine heye di 14.12.2018 di demên din ên salê de jî serlêdanên malbatan jî ne bi huqûqî bi hinceta desteya dîsîplînê ya 14.09.2018an hatine asteng kirin.

Di vê çarçoveya me da xuya kirin de 102 jê yên parêzeran, 46 jê yên malbatan temamê daxwazên serdanê hatine red kirin. Girêdayî bi rewşê ve her sê girtiyên neqlî Girtûgehê Giravî ya Îmrallyê hatine kirin jî nikarin bi parêzer û malbatên xwe re hevdîtinan bikin.

II. NEKARÎNA BIKARANÎNA MAFÊ RAGIHANDINÊ Û ÇÊBÛNA HAYDARIYÊ JI HEV Û DIN

Wek ku tê zanîn Rêzdar Abdullah Ocalan û parêzerên xwe herî dawî di 27ê Tîrmeha 2011an de kariye hev û din bibînin. Hevdîtin pê re herî dawî di 11ê Îlona 2016an da çêbûye. Piştî vê hevdîtinê ji Rêzdar Ocalan û sê miwekîlên ne bi name, ne telgraf ne jî bi rêya faksê bi tu awayê hay çenebûye, bi heman awayî pêkan nebûye ku mirov xwe bi postayê jî bigihîne wan.

Wek ku me li jor jî got; tevî ku hevdîtin bi miwekîlên li Îmrallyê re hatiye asteng kirin, Dadgêriya Înfazê ji xeynî sînordar kirina hevdîtinê biryara sînordar kirina par kirina belge, zanîn û telefonê û çêbûna hayê ji hev û din bi nivîsî daye û têkiliya miwekîlên me bi derve re bi temamî biriyê. Di vê rewşê de bûyê hema bibêje mirov nekare tu saloxan ji miwekîlan bigire. Di sala 2018an de parêzeran di tarîxên .08.2018, 20.09.2018, 09.11.2018, 27.11.2018 û 21.12.2018an de di der barê geşepêdanên huqûqî û serlêdanan de name şandine. Lê belê ligel ku nayê zanîn bê ka name gihiştine an na; her wiha nayê zanîn ku miwekîlan ji van nameyan re tu name şandine an na.

III. HELWESTA KOMÎTEYA BERGIRTINA LI ÊŞKENCEYÊ (CPT)

Ji roja ku tecrîda esehkirî dest pê bûye hevdîtînen pêwîst û agahdar kirin misêwa hatine kirin ji bo Komîteya Bergirtina li Êşkenceyê (CPT) ku endameka Konseya Ewropayê ye, rayeya xwe ya kirina serdanê li girtîgehên dewletên endamên yekîtiyê ne û dikare raporên bînpêkirinên mafî amade bike. Di sala 2018an de jî bûyerên bi her awayî yên huqûqî û siyasî û rewşên têkildarî Girtîgeha Giravî ya Îmraliyê û Rêzdar Ocalan qewimîne, bi awayê raporên peyitandinê pêşkêşê CPT'yê hatine kirin. Geşepêdanên di tarîxên 01.01.2015-25.06.2018, 25.06.2018, 10.10.2018 û 12.10.2018, 31.10.2018an de û raporên têkildarî peyitandina rewşa heyî pêşkêşî CPT'yê hatine kirin di hevdîtînen rûbirûyî de hatine ragihandin.

CPT'yê ji ber ku nekariye erê kirina rapora xwe ya têkildarî serdana ji bo Girtîgeha Îmraliyê ya dawî ya 8-29ê Avrêla 2016an ji Tirkiyeyê bigire nêzîkê piştî du salan di 20ê Adara 2018an de bi gel re par kiriye. CPT'yê di vê raporê de diyar kiriye ku ji ber sedemên wek pêknehatina tu serdaneke parêzerî ji 27ê Tîrmeha 2011an ve ji aliyê danîna têkiliyê bi dinyayê re ya Rêzdar Ocalanî ji sala 2013an û bi vir de tu geşepêdan nîn e û rewşa wî xerabtir bûye. CPT'yê cardin bang kiriye ku bêyî derengî bikeve divê gav werin avêtin da ku girtiyên di Girtîgeha Îmraliyê de malbat û parêzerên xwe bibînin. CPT'yê her wiha peşniyaz kiriye ku şert û mercên girtiyên cezayê heta bi hetayê girtine li gor mijarenameya têkildar werin sererast kirin.

Lê belê CPT'yê bi vî awayî parek bînpêkirinên giring par kiribe jî piştî serdana dawî ya 28-29ê Avrêla 2016an nehesab kirina geşepêdanên siyasî û huqûqî li Tirkiyeyê, û xwe li nedîtîne danîna bînpêkirinên dibin sedema bi sazî bûyîna tecrîdê bûye kêmasiyeke bîngehîn. Ji tarîxa hevdîtina malbatan a piştî serdana dawî ya CPT'yê yê di encama berteka gel a demokratîk de di 11ê îlona 2016an de pêk hat pê ve; ta niha rewşeke mirov hay ji rewşa rêzdar Ocalanî çêbibe pêk nehatiye.

Tevî vê yekê pergala huqûqê ya Tirkiyeyê di zemînekî ne demokratîk de bi neyînî gelek guheriyê û bi paj de çûye. Rewşa awarte û rejîma Biryarnameyên Bi Hukmê Qanûnan hatine qewîn kirin, navenda bîngehîn a pêkanînê wek ku me li jor got bûye Girtîgeha Îmraliyê. CPT'yê hevdîtina ku di sala 2016an de kiriye piştî du salan di sala 2018an de ragihandiye û Girtîgeha Îmraliyê tevî salnameya xwe ya serdanan nekiriye. Berpirsiyariya xwe ya venihêrîna bînpêkirinên pêk dihên li Girtîgeha Îmraliyê wek sazûmaneke bîngehîn pêk neaniye.

CPT di qada serweriya Dewletên Aliyê Peymana Bergirtina Li Êşkenceyê ya Ewropayê de, xwediyê wê rayeyê ku biçe serdana her kesên bi tesarûfa meqamên dewletî ji azadiya xwe bêpar tînin hiştin; anku xwediyê wê rayeyê ye ku li van deran vekolîn, lêkolîn û venihêrîne bike. (Xalên 1,2, 7 ên peymanê). Dewletên Alî, berpirsiyar in ji dayîna destûrê ji bo Komîteyê û kirina hevkarîyê bi Komîteyê re. (Xal 2,3). Tevî van geşepêdanan tevan bikarnehana van rayeyên xwe ya CPT'yê tevkarîyeke nebaş li geşepêdan Pergala Tecrîdê li Îmraliyê dike.

IV. DOZ Î HEWLDANÊN HUQÛQÎ YÊN BERDEWAM IN

A. Serlêdanên li Dadgeha Bîngehîn û Di Huqûqa Navxweyî de Berdest in

Di sala 20emîn a Pergala Tecrîdê ya Îmraliyê ku ji bo rêzdar Ocalan tê pêkanîn her

ku diçe bi awayekî nehuqûqî û kêfî bêhtir giran dibe, mijarenameya heyî jî li ser vî asasî tê sererast kirin. Sazûmanên darazê yên di huqûqa navxweyî de pêkanînên nehuqûqî û kêfî bûnê bi pêj de dibin. Le di her rewşê de misêwa, li hewldanên huqûqî yên arasteyî tek birina tecrîdê û rayedaran vedixwînin ji bo huqûqê te dewam kirin.

Di vê çarçoveyê de dosyeyên li Dadgeha Bingehîn û di Huqûqa Navxweyî de berdewam in;

1- Li gor xala 25emîn a Yasayê Înfazê yê bi hejmar 5275an ji bo pirsgirêkên tendurustiyê yên di şertên înfazê de çareser nabin tevî ku di nexweşxaneyêke tam tekûz de ya jî li nexweşxaneyêke zanîngehê pêkan û pêwîst e nahêlin rêzdar Ocalan û girtiyên din ên Îmraliyê ji vî mafî sûdê werbigirin. Ji bo girtî bibin xwediye vî mafê tendurustiyê û qedexehiya parêzeran bi dawî bibe ser li Dadgêriya Înfazê ya Bursayê hatiye dayîn di 12ê Tîrmeha 2013an de. Lê hatiye red kirin. Pê re di dana ser li Dadgeha Bingehîn bi hejmara serlêdanê 2015/12433 bi takî serlêdan hatiye kirin lê hêj jî bi dawî nebûye.

2- Di ser hevdîtina dawî ya parêzeran a 27ê Tîrmeha 2011an de ligel ku bi qasî salek buhuriye, di 05.11.2012an de ji bo guncaw kirin şertên girtîgehê li gor huqûqê û bi cih anîna şertên hevdîtîna yên parêzeran serlêdan hatiye kirin li Dadgêriya Înfazê ya Bursayê. Dadgêriyê piştî demeke dirêj bersiva redê dayê ji bo serlêdanê. Ev serlêdana heyî jî wek serlêdana li jor îcar hatiye şandin ji bo Dadgeha Bingehîn bi hejmara asas 2015/11221ê lê Dadgeha Bingehîn jî biryarek nedaye ji bo vê serlêdanê.

3- a – Ragihandina Rewşa Awarte ya Tîrmeha 2016an, pêkanîna xwe ya pêşî bi biryara Dadgêriya Înfazê bi tarîx 21.07.2016an li Girtîgeha Îmraliyê nîşan daye. Li ser red kirina îtirazên ji bo rakirina vê biryara tu sererast kirineke huqûqî rê nade serlêdan li Dadgeha Bingehîn hatiye kirin 27ê Cotmeha 2016an lê hêj tu biryar nehate dayîn.

b- Li Dadgêriya Înfazê ya 1emîn a Bursayê, Dadgeha Giran a 2emîn a Bursayê ku biryara di 21.0.2017an de me li jor diyar kir dane gilî hatiye kirin ji Desteya Dadgêr û Dozgeran. Dîsa bi heman awayî tevî serrastkirina “sînordar kirina parêzeran” ji ber red kirina serlêdanan, giliyê dozgerî jî hatiye kirin ji Desteya Dadgêr û Dozgeran. Lê di vê mijarê de jî tu geşepêdan neqewimiye.

c- Têkildarî serdana miwekîlan di 19.10.2017an de, vekolîna şertên girtinê, girtina rapor û guncaw kirina şertên heyî li gor huqûqê serî li Saziyên Înfaz û Ceza yên Bursayê û Raçav Kirina Girtîgehan hatiye dayîn. Ev serlêdan jî hê aktuel e lê geşepêdan neqewimiye.

4- Piştî 15ê Tîrmeha 2016an ji aliyê çavkaniyan ve pir û pir hatiye derbirîn ku leşkerên derbekar Girtîgeha Îmraliyê û Rêzdar Ocalan ji xwe re kirine hedef. Ev rewş di mijara tenduristî û ewlehiyê ya Rêzdar Ocalan de gel endîşedar kiriye. Ji bo hilanîna ji navê ya van şik û gumanan ji bo pêkanîna hevdişînekê bi miwekil re demildest serlêdaneke bi daxwaza tedbîra ihtiyadî serlêdan hatiye kirin. Dadgeha Bingehîn daxwaza tedbîrê red kiriye, di der heqê ya asas de jî hê biryar nehatiye dayîn.

5- Biryara sînordar kirina ragihandin, hayîdar bûyîn ji hev û din û hevdişînan ku bû sedema qut bûyîna têkiliya Rêzdar Ocalanî ji dinyayê ku bi nehuqûqî ji aliyê Dadgêriya Înfazê ya 1emîn a Bûrsayê ve di 02.03.2018an de hat dayîn bi biryara bi tarîx 6.04.2018 û bi hejmar 2018/647 a Dadgeha Cezayên Giran a 1emîn a Bûrsayê hat sererast kirin, erê kirin û eseh kirin. Wek ku me li jor jî rave kir, têkildarê vê biryara nehuqûqî di 06.06.2018an de me bi hejmara asas 2018/15703 serî li Dadgeha Bingehîn da. Di der barê serlêdanê de hêj tu geşepêdan neqewimiye.

6- Bi qedîna qewlê qerarê bi dîrok 02.03.2018 ji aliyê Dadgêriya Înfazê ya 1emîn a Bursayê ve bi biryara bi tarîx 06. 09. 2018 û bi hejmar 2018/1416yê bi heman navirokê biryara sînordar kirinê hatiye dayîn. Ev biryar jî ji aliyê Dadgeha Cezayên Giran a 1emîn a Bursayê ve wek xwe hatiye erê kirin û eseh kirin. Têkildarî vê biryarê jî me di 19.10.2018an serî li Dadgeha Bingehîn da bi hejmarê asa 2018/30824an. Dadgeha Bingehîn daxwaza tedbîrê yê beşê yekemîn bi biryara komîsyona duyemîn red kir. Lê di der heqê asasî de hê biryar nedaye.

5- Têkildarê biryarên bi tarîx 14.09.2018 û bi hejmar 201871-2-3-4 ên Desteya Dîsîplînê Girtîgeha Îmraliyê ku bûn sedema mayîna duçarê sînordar kirina hevdişîna malbatan bi 3 mehan a rêzdar Ocalan û miwekilên din di merheleya pêşîn a di kirariyên huqûqî yên li Dadgêriya Înfazê ya Bursayê tèn bi rê ve birin, ligel ku îtiraza bi wekalet hatiye pêşkêş kirin parêzer daxilî dosyeyê nehatine kirin. Bi parêzeran re tu zanîn û belge nehatiye par kirin, tew bi ser de revî revî biryar hatiye dayîn û erê kirin. Hê ku pêvajoya serlêdana Dadgeha Bingehîn dewam kiriye têkildarê van dosyeyan, ji ber kirinên nehuqûqî û kêfî di der barê dadgêrên berpirsiyar de di 17.12.2018an de gilî û serlêdana sûc hatiye kirin ji Serdozgeriya Komarê ya Bûrsayê re.

6- Ligel ku qewlê biryara sînordar kirina hevdişîna malbatan qediyaye piştî 14.12.2018an dîsa lê hatiye dewam kirin. Daxwaz ji Dadgêriya Înfazê ya 1emîn a Bûrsayê hatiye kirin ku bi boneya derbas bûyîna qewl û dê nimîndeyê yasayî nede ber xwe ku were rakirin. Li ser red kirina daxwazê bi biryara bi tarîx 12.12.2018 û bi hejmar 2018/6132 ji aliyê Dadgêriya Înfazê ve îtiraz li biryarê hatiye kirin lê hê di mijara îtirazê de tu geşepêdan çênebûye.

7- Azadî û mafên herî bingehîn ên rêzdar Ocalanî, azadiya çêbûna hayê ji hev û din, rêzdarî li jiyana taybet û azadiya derbirînê û hevdişîna bi parêzerên xwe re jî tê de ne. Lê ji ber ku Rêzdar Ocalan ji mafê xwe yê hevdişîna bi telefonê bêpar hatiye hiştin, serlêdana bi tarîx 19.09.2016 û bi hejmara asas 2016/21369 hatiye kirin hêj berdewam e.

10-) Ji bo rakirina biryara berhev kirin û qedexe kirinê ya Dadgêriya Ceza û Silhê ya lemîn a Wanê ya li ser pirtûkên “Şaristanî”, “Şaristaniya Kapîtalîst” û “Sosyolojiya Azadiyê” ku rêzdar Ocalan wek parastin daye Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê û xwediyê aşkerayiyeka navneteweyî û rewabûnê ne serlêdana di 15ê Sibata 2016an de li Dadgeha Bingehîn hat kirin berdewam e. Li hember qedexe kirina ji bo pirtûka pêncemîn vê rêza vê parastinê, ligel ku ji Dadgeha Bingehîn ve biryara bînpê bûna azadiya derbirinê hat dayîn di 25.06.2014an de, ji aliyê dadgehên herêmî ve cardin hat qedexe kirin, Destûra Bingehîn hat bin pê kirin.

B. Serlêdanên Li Ber Destê Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê ne:

Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê têkildarê darizandina rêzdar Ocalan de li ser du mijarn biryara bînpê kirinê daye. Ev biryar têkildarê Darizandina Ji Nû Ve û Cezayê Girankirî yê Heta Bi Hetayê ne. Lê bi derengî xistina serlêdanên û bi hesab nekirina û dosyeyên bi aşkerahî bînpê kirin he ne tê de, dayîna biryaran bi tenê li ser bersivên hikûmetê di kûr bûyîna Tecrîdê li Îmralityê de rê li tevkariyeke negatîv vedike.

Her wiha biryara redê Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê ji bo serlêdana bi hejmar 12261/10 têkildarê midaxeleya fizîkî ya rêzdar Ocalan di sala 2008an de di hucreya xwe de rû bi rû ma dabû bandoreke bi vî awayî kiriye. Lewra ligel ku li ber çavan e ku pêvajoya lêpîrsînê bi aşkerahî nehatiye kirin, biryareke wiha hatiye dayîn. Ligel ku di tu merheleyeke dosyeyê de serî li şahidiya rêzdar Ocalanî nehatiye dayîn, guh nehatiye dayîn ji bo îdiayên parêzeran jî. Piştî bûyerê bi du salan CPT'yê di serdana xwe de ji bo dewam kirina pêvajoya huqûqî û bi feraseta xwe ya hêminî nekirina rojevê ya midaxeleya fizîkî bi taybetî ji bo redê kiriye hincet ji xwe re. Di sala 2009an de ji ber pîrsgrêkên wiha guhertina personelên li Girtîgeha Îmralityê. CPT'yê ji bo vê yekê xwe li nedîtîne daniye. Ji ber sedemên wiha biryara ku DMME'yê di vê dosyeyê de daye biryareke bi rexne û minaqeşe ye.

DMME'ya ku di mijara sepandina pîvanên mafê mirovan ê gerdûnî li gor huqûqa pozîtîf û venihêrînê de saziyeke ji saziyên herî rayedar divê li gor mîsyona xwe tevbigere. Di vê çarçoveyê de ji bo DMME serpereştîyê bike dosyeyên li DMME'yê berdewam in;

1-Di sala heftan de qedexehiya parêzeran a bê navbir di 27ê Tîrmeha 2011an de dest pê bûye. Piştî qedexehiya hevdîtinan bi 3 mehan, li ser bê encam mayîna serlêdana xwecihî ya Cotmeha 2011an serî li DMME'yê hatiye dayîn li ser navê Rêzdar Ocalan û 5 miwekîlên hingê li bal bûn bi hejmara serlêdanê 74751/11an. Di pey re tevî ku pîrsa encama serlêdanê û agahdar kirinê hatiye kirin, DMME'yê tu pêşxistin bi dest nexistiye di vê dosyeyê de. Ji 27ê Tîrmeha 2011an ve tu hevdîtineke parêzerî pêk nehatiye, 8 sal in ku hevdîtina parêzeran tê asteng kirin. Divê DMME bêyî ku hinekî dîn bike derengî divê biryarekê bide.

2-DMME'yê hukm daye ku piştî teslîm kirina Tirkiyeyê rêzdar Ocalanî bi kompoyeke navneteweyî di sala 1999an mafê darizandina adilane bînpê kiriye. Xala 311.an Qanûnê Mihakemeyen Cezayî yê mafê darizîna ji nû ve serrast dîkin, ji bo bi taybetî rêzdar Ocalan ji vî mafî sûdê wernegire hatiye serrast kirin.

Ji bo ku rêzdar Ocalan jê sûtê wernegire ji bo îade kirina mafên dosyeyê yê bi sedan kesên ji serrast kirina qanûnî ya sala 2003an bi neyînî jê bi bandor bûne di 11.04.2013an de cardin serrast kirina qanûnî hatiye kirin. Lê di vê serrast kirinê de jî ji bo rêzdar Ocalan jê sûtê wernegire halekî nadir/awarte hatiye danîn. Li ser serrast kirina yasayî ya taybet ji bo kesan mafê wekhevîyê yê Destûra Bingehîn bînpê dike, nikare rê li ber darizandina ji nû ve ya rêzdar Ocalanî bigire serlêdanên li Dadgeha Destûra Bingehîn hatin kirin man bêncam bi qeyda serlêdanê 34836/16 serlêdana li DMME'yê hatiye kirin berdewam e.

DMME'yê di biryara xwe ya 18ê Adara 2014an de (Numreya Serlêdanê ya Dosyeya Bihevvekirî: 24069/03, 197/04,6201/06 û 10464/07) diyar kir ku cezayê heta bi hetayê girankirî yê dayîna cezayê heta bi hetayê ji bo rêzdar Ocalanî serrast dike di çarçoveya xala 3yemîn a peymanê de cezayekî dijmirovî ye û li dijî qedexehiya miemeleya xerab e û Tirkîye mehkûm kiriye. Li Tirkîyeyê di girtûgehan de niha bi sedan girtiyên bi cezayê heta bi hetayê yê girankirî he ne. Piştî vê biryara DMME'yê divê Hikûmeta Tirkîyeyê ev ceza bida ber çavan, bi serrastkirinên yasayî li gor biryarên DMME'yê baş bikira, heta niha tu gav neavêtine. Pêwîstiya bi huqûqî ya vê biryarê ew e ku bi serrast kirina yasayî cezayê heta bi hetayê ya cezayê girtûgehê were rakirin. Di der heqê vê xisûsê de hewldanên parêzeran ligel Komîteya Wezîran a Konseya Ewropayê ku ji şopandina biryarên DMME'yê berpirsiyar e berdewam in. Komîteya Wezîran a Konseya Ewropayê, ev biryara ku DMME'yê ji bo rêzdar Ocalanî daye daye ber demajoya şopandinê. Ji bo bi cih anîna biryara DMME'yê di 06.06.016, 05.0.2017 û 5.06.2018an de serî li Komîteya Wezîran hatiye dayîn bi nivîskî û di tarîxên ji hev û din cuda de hevdîtînen rû bi rû hatine kirin. Di serlêdan û hevdîtînen hatine kirin de ji bo ketina hewlan û tevî ku 5 sal di ser biryara bînpê kirinê re buhuriye daxwaz hatiye kirin ku bê Tirkîyeyê biryara DMME'yê bi cih anîye an na were peyitandin.

3- Çar serlêdanên ji hev û din cuda yê rêzdar Abdullah Ocalan ên di salên 2003, 2004, 2006 û 2007an de li gel DMME'yê hatine kirin, hatine bi hev ve kirin û di 14ê Adara 2014an de bi awayê çar dosyeyên bihevvebûyî wek dosyeyeka bi tenê hatiye bi encam kirin, biryar di 18ê Adara 2014an da hatiye ravekirin. DMME'yê hin xalên ji bo wan daxwaz hatiye kirin ku hukmê bînpê kirinê bê dayîn, û ji bo hinan jî tu hêlsengandin nekirine. Ji ber ku qewlê bi sê mehan ê tekez ê ketina heq a îtiraza dê ji Daireya Mezin re were kirin he ye, di çarçoveya mafê parastinê di der barê biryar û navirokê de ji bo kirina hevdîtîne bi rêzdar Ocalanî re bi daxwaza tedbîrê serî li Dadgeha Destûra Bingehîn hatiye kirin. Lê belê li ser red kirina dosyeya bi hejmar 2014/5264an ji aliyê Dadgeha Destûra Bingehîn ve, dosye di 28ê Îlona 2018an de întiqalê DMME'yê hatiye kirin.

V. ENCAM

Qedexehiya miwekilên li Girtûgeha Îmralityê ya hevdîtina bi parêzeran re ji 27ê Tîrmeha 2011an ve berdewam e. Ji 11ê Îlona sala 2016an ve bêyî navbir bi tu awayî xeber ji wan nehediye girtin. Qedexe kirina hevdîtina bi her awayî û çêbûyîna hayê ji hev û din bi biryarên dadgehan, tecrîdê girantir dike. Hem yasayên bi meriyet bûne ji aliyê Pergala Tecrîdê li Îmralityê, hem jî ji aliyê îctihadên dadgehan kirine ve sala 2018an bûye saleke bêhtir bi pîrsgirêk û bi şik û guman.

Di serdemeke ku di huqûqa navxweyî de ewqas xitimîn he ye, DMME'yê guh

nedayê tu îdiayên bê bingeh û serlêdana midaxeleya fizîkî bi paj de kişandiye, lê têkildarê hevdiñên bi parêzeran re yên ji 27ê Tîrmeha 2011an heta bi niha tên asteng kirin tu biryarê nade. Ev helwesta DMME'yê Tecrîda li Îmraliyê yekcar girantir dike.

- CPT'yê serdana xwe ya Girtîgeha Îmraliyê ya di 28-29'ê 2019an de kiriye du sal bi şûn de diyar kiriye. Naviroka daxuyaniyê hin bînpê kirin derxistine holê lê dema daxuyaniyê û xwe nedanîna li bînpêkirinên tecrîdê girantir dikin, tevkarî li giran bûyîna Tecrîdê li Îmraliyê kiriye. Ji hevdiñina dawî ta bi îro wek ku geşepêdanên huqûqî û siyasî yên qewimîne hesab neke nekirina serdana Girtîgeha Îmraliyê CPT'yê dike yek ji berpirsiyarên negirtina xeberê ji Îmraliyê bi demeke dirêj.

- Komîteya Wezîran a Konseya Ewropayê, bi salan e pêkneanîna biryarên DMME'yê, tevî ku ji bo rakirina ji holê ya bînpêkirina di biryarê de he ye serrast kirina yasayî nake, peyitandina rewşê nake, Tirkiyeyê wêrek dike di mijara bi cih neanîn biryarên Tirkiyeyê de.

- Li ser asasê ev rewşên me diyar kirin ranebûyîna bi erka xwe ya saziyên huqûqî yên neteweyî û navneteweyî, xwe ker kirina ji rewşa li Îmraliyê ya geşe pê dide, rê li girantir bûyîna Pergala Tecrîdê ya Îmraliyê vedike.

- Tevê van tamamê rewşan li Îmraliyê, li hember Pergala Tecrîdê ya li Îmraliyê ya ku bi kirinên nehuqûqî û nedemokratîk giran bûye di heman katê de têkoşaneke huqûqê ya demokratîk jî bi rê ve diçe. Em Buroya Huqûqê Asrîn birên hestiyar vedixwînin ku tevkariyê li têkoşana huqûqê ya demokratîk a li dijî Pergala Tecrîdê ya Îmraliyê bi rê ve diçe bikin û saziyên neteweyî û navneteweyî yên xwediyê berpirsiyarê vedixwînin ku di çarçoveya mafê mirovan ê gerdûnî de li gor berpirsiyariya xwe tevbigerin.

BUROYA HIQÛQÊ ya SEDSALÊ